# GULISTAN

36




Kovarek Wêjeyî û civakî ye
Hijmar 36 Payiza 2007

www.arsivakurdi.org



Ev kovar kovara te ye
Ev bax û gulîzara te ye
Tê de darek xweş biçîne
Ev dar  nivîsara te ye

Cegerxwîn

Kovarek Wêjeyî û civakî ye
Hijmar 36 Payiza 2007

www.arsivakurdi.org

# Gulistan
# Û
# 50 Saliya P.D.P.K.S Ya Zêrîn

Gava em dîroka partî dîmoqratî pêşverû kurd li sûrya dişopînin di cejna

wê a zêrîn de , em kovara Gulistan di vê rêça pîroz de bê par nabînin ,ji ber ku wê 39 salan ji vê dîrokê bi serbilindayî berdewam kir ,ji dema weşandinê di nîsana sala 1968 an de heya îro, roleke wê ya giring di xurtkirina hestê netwî dinav gelê kurd de heye ,û gelek kar kiriye di pêşxistina çanda kurdî ya resen de , bi taybetî fêrbûn û hînkirina zimanê kurdî , herweha berhemên wê mîna baranê bi ser qadeka tî de dibarin , ji ber gava pêşî bû ku bi zimanê kurdî kovarek giştî tê weşandin ji alî partiyek kurdî li Sûryê û bi rengekî fireh derket û belav bû ji alî partî ve , û ji aliyekî dî ve ji ber kû berpirsiyar û damezrînerê wê torevan û helbestvan ú xebatkar û mamostayê mezin Cegerxwîn bû. , ji ber ku ev karê pîroz û giranbuha hemî ji afrandin û ramanên wî bûn ,Cegerxwîn xortê nivîskar li gulîstan kom dikirin û bang li xwendevanan dikir û ji wan dixwest ku di gulistan de binvîsin û digot

Ev kovar kovara te ye
Ev bax û gulzara te ye



www.arsivakurd.org

Tê de darek xweş biçîne
Ev dar nivîsara te ye

Bi vê helkefitina pîroz , em ji nivîskar û xwendevanên hêja dixwazin ,ku li vê banga Cegerxwîn xwedî derkevin , ramanê wî hilgirin , bibin xebatkar û rewşenbîrê bi rastî ,xama xwe di xizmeta doza gelê xwe de bixebitînin. çi ji hêla welatparêzî , milet perwerî , ramyarî , zimanparêzî , mirovayetî û çandî li ser bingehek rast û durist.

**Gulistan**

www.arsivakurdi.org

# Zimanê kurdî biparêzin

Selman Heso

Her kez dizane ku hebûn û mana miletê kurd li sûrya girêdayî ye bi hebûn û mana zimanê kurdî , ev rastî xuya bûye û hatiye gotin li ser zimanê piraniya zaniest û pêşengên kurd wek Mîr Celadet Bedirxan û Dr.Nûredîn zaza û Cegerxwîn .. û hemû welatparêzên kurd .

Van ciwamêra netenê ev rastî gotin û hew, lê belê jêre baş xebatek bê westan jî kirin , zimanê kurdî xistin warê bikaranînê,nivisar û kovar û dîwan bi kurdî cap kirin ,di nav millet de bela kirin û gerandin , xwe westandin û êşandin û cûn zindana , malê xwe dan , feqîrî ditin , lê man li dû wê dozê û jê venegeryan ..

Di salên 1930 û virde weşan bi zimanê kurdî li sûrya bi fermî destpêkir , di sala 1931 mîr Celadet Bedirxan li şamê ruxseta çapkirina kovara Hewar) stand ji wezareta navxo ya sûrî ,ev kovara giring ya ku rolek dîrokî leyist capkir û belav kir jimarek zor ji kurdê sûrî bi xwendina hewarê hînî zimanê



www.arsivakurd.org

xwe bûn , jimarek niviskar jî bi xêra hewarê û kovarên dî ko çêbûn û dest bi karanina zimanê kurdî kirin .

Ev kar bû bingehek kûr û xurt ji hinbûna xewndin û nivîsê bi zimanê me , û ew bû hişt ku qûnaxa didwa ya ku merev kare navê wê bike ( qûnaxa Cegerxwîn ) ku di salên 1940 û virde dest pêkir, Cegerxwîn bû stêrek geş di ezmanê kurdî de , nexasim ku ew wek fidakarekî bê hempe li nav millet gerya , ristên wî bûn li ser zimana wek banga Azadiyê û kurdayetî û naskirina Nasnama kurdî ..

Cegerxwîn bi çapkirna dîwanê xwe û belavkirna wan hişt ku bi hezara kurd xwendina bi kurdî hîn bibin û ji zimanê xwe hez bikin û pê bi nivêsin , û gava ku Cegerxwîn kovara Gulistan di sala 1968 an de damezrand derîkî fireh li ber pêşveçûna zimanê me vekir ,li pêşya xort û qîzê kurd ku bibin nivîskar û hozanvan ku jimara wan îro bi hezara ye .

Gelo nifşê nuh ji miletê me wê vê rêbaza pîroz ya parastina zimanê kurdî bişopîne wek çawa mîr Celadet û Cegerxwîn bi wê fidakariyê xebitîn ?



www.arsivakurdi.org

# Di 50 Saliya Damezrandna partya dîmoqrati pêşverû kurd li Sûrya Ahingeke giring li Silêmanî

**Amadekirin : Elî Şemdîn**

*Di roja 14/06/2007 ya bîranîna 50 Sali ya damezrandina partya dîmoqrati pêşverû kurd li Sûrya ,Ahingeke taybet pêkhat ku gelekî bû cihê balkêşî acansê ragihandnê û behsa wê bû di piraniya rojnamegerya kurdî ...*
*li jêr riportacek li ser vê Ahingê :*

## Gotina Partiya me ya ( PDPKS ) di ahenga yobîla zêrîn de li Silêmaniyê

Gelî mêvanên delal .. hevalên hêja û xebatker :Cejna we pîroz be , û bi navê rêxistina partiya xwe em bixêrhatina we dikin , û em xwe bextewar dibînin bi vê beşdar bûna we li vê ahengê ku me li darxistiye ji bo yobîla zêrîn ya partiya me ( Partiya dîmoqrtî pêşverû kurdî li sûriya ) , ku berî 50 salî , di roja ( 14.6.1957 ) hatiye damezrandin bi destê hersê xebatker û ronakbîrên bi nav û deng ( Hemîd Derwîş , Osman Sebrî , Hemze Newêran ) .. Mêvanên berêz :Îro em vê şahiyê dikin bi derbasûna pêncî salî ji xebatek bêrawestan li dijî zulim û zor û bindestiyê , ku rêcîmên şovînî li dijî

miletê kurd li sûriyê bi tûjayî dane meşandin , ji girtin û lêdan û binçavkirin û erebkirina navçe û dever û bajarên kurdî li sûrî , û sitandina erd û nasnamên wan di dema jimartina awarte de sala 1962 û dema pêkanîna zinara erebî ku sala 1966 hatibû destpêkirin ..

Em îro li hev civiyane ku wan kesan dibîra xwe bînin ku berî 50 salî dest bi xebatê kiribûn û di gotin divê ev miletê bindest ji bin zordestiyê derkeve û bi serbestî mafên xwe yên netewî ( siyasî , çandî , civakî ) bi dest xwe bixe , û dive ziman û filklor û dîroka xwe binase û hînî hebûn û armancên xwe bibe , û bi xelkê vî welatî re bi wekhevî jiyanek hevbeş bijîn , û xebatek dîmoqratî bi hev re bikin ji bo pêkanîn sazûmanek dîmoqratî li ser bingeha serbestî û wekheviyê ku pirsgirêka kurdî jî têde çareseriyek durust bibîne ..

em di demekê de dicivin ku rewşek nûjen avabûye û guhertinên mezin di cîhanê de cî bi cî bûne , û pirsgirêka kurdî jî ji bin tariyê hatiye ber roniyê û ketiye ber çavan , nexasim li Kurdistan îraq ku miletê kurd li wir jiyanek azad di jî di bin siya sazûmanek dîmoqratî û fîdralî de , û birastî li hember vê guhertinê xebatek xurtir û bi hêztir ji tevgera kurdî tê xwestin , di warê netewî û niştimanî de ..

Nayê veşartin ku partiya me di xebata xw ya 50 salî de li gelek kelem û astengiyan rasthatiye , çi ji alê



www.arsivakurd.org

desthilatên şovînî de û çi ji alê dûvik û nokerên wan ve , ku xebatkerên partî didan ber girtin û lêdan û sergonkirinê û did an pûçkirin .. lê evan keleman nikarî bû xebata partiya me bi sekinîne, belê xurtir û bi hêztir kiriye , çi di warê rêxistinî û cemawerî de ku li her dever û herêmên kurdî belav bûye û rehên xwe kur berdane nav milet , û çi di warê siyasî de ku partiya me xebatek dîmoqratî aştî daye meşandin dûrî siloganên beloq û tûj û dûrî piropoganda dirû û derew , evê siyasetê baweriya hêzên kurd û ereb û aşûrî xutirkir û têkiliyên wan bi partiya mere kûrtir kir , vaye partiya me îro di hundurê çarçewk siyasî hevbeş de bi navê ( Hevbendiya Dîmoqratî Kurdî li Sûriye ) xebatê dike , û di hundurê komîta hevbeş ya ( Hevbendî û Enî ) yê de ciyê xwe girtiye û bi hevre kardikin ji bo li darxistina kongirekî netewî û helbijartia lêvegerekê , û wiha reng jî bi hêz û partiyên niştimanî û dîmoqratî re ( kurd , ereb , asûrî ) , ku bi hevre di yek çarçewê de û di bin navê ( Daxwiyaniya Şam ) de xebatek hevbeş dikin ji bo pêkanîna guhertinek aştî û dîmoqratî di welêt de û ji bo li darxistina sazûmanek dîmoqratî ku pirsgirêka kurdî têde were çareserkirin bi şêwekî dîmoqratî durust , û li derve jî rêxistinên partiya me xebatek xurt dikin ko dengê miletê xwe bigihînin hemî dewlet û hêz û rêxistinên dîmoqratî û yên bawermend bi mafên mirovan , û li wan doza



www.arsivakurd.org

piştgiriya pirsgirêka kurdî dikin , û divî warî de partiya me gelek ser bilinde bi têkiliyên xwe yên kûr li gel hêz û rêxistinên kurdistanî û di pêşiya wan de yekîtiya niştimanî kurdistan , ku ji gava pêşîde mam celal li kêleka hevalan sekinî di damezrandina pariya me de ku di wê demêde li şam dima û destekî wî xurt hebû di nivîsandina rêznama siyasî de ku ta niha jî rastiya wê rêznamê her zelaltir dibe ..Di dawî de em cejna we dûbare pîrozdikin û hêviya serkeftinê ji xebata were dixwazin û bimînin di xweşiyê de û sipas ji guhdarkirina were

# Daxwiyaniya Partiya me ya di Kongirê Rojnamevanî de

Di ( 14.6.1957 ) de ( Partiya Dîmoqrata Pêşverû Kurdî li Sûriye ) hate damezrandin weke yekemîn rêxistina siyasî kurdî li sûriya , û partiya me dest bi xebata xwe ya siyasî dîmoqratî kir li ser bingeha rastiya hebûna parçek ji miletê kurdî di hundurê sînorê dewleta sûrî de , û ew bi xwe di herêmên xwe yên dîrokî de dijî (cizîr , koban , kurdax ) , û bûye parçek giring ji laşê welat , û tê nasîn bi rûçikên netewî yên taybet , ji ziman û hastên hevbeş .. Partiya me xebatê dide ser milên xwe ji bo :

- çareser kirina pirsgirêka kurdî di hundurê sazûmaneke dîmoqratî nûjen de , ku maf û serbestiyên giştî bi kar bîne , û mafên mirov biparêze , û rehên dîmoqratîiyê û wekheviyê kûr û asê bike , û rê li ber sîstema tek partî bigire , û rê veke li ber serbestiya nerîn û civîn û xwepêşandan û serbestiya rojname û çapemeniyê ..
- danîna destûrek nûjen ku wekheviyê pêkbîne dinav hemwelatiyan de , bê vegera li bingehên wanî netewî û olî û ramiyarî , û dive netewa kurdî wek netewa diwemîn li welat bête naskirin .
- rêzgirtin li mafê hemi kêmnetewan li welat .
- rakirina siyaseta zordestiya neteweyî ku li dijî miletê kurd tê meşandin li sûrî ,û hemi siyasetên din yên ne yasayî ku li dijî teybetmendiyên wî yên netewî tên bikaranîn ku dixwaze rehên wî ji kok de rakirin mina pirojeya : ( kemera erebî , û hejmartina 1962 ) , û ji bo cî bi cîkirina mafên netewî yên miletê kurd li sûriya yên ( siyasî , çandî , civakî ) ..
- rêvekirin li ber miletê kurd ku hevbeşbibin di sazkirina siyaseta welêt de û di hemi dezge û birêvebir û komîteyên ( dadgehî , desthilatdarî , perlemanî ) , û hemî rêxistinên din jî bê cudayetî , û rêz li hebûna netewan dive were girtin di welat de , û dive ku sazûmana rêvebirî li gor hebûna van netewan be .
-rêdan bo miletê kurd da ku zimanê dayikê û çanda xwe bi karbine , û pêkanîna wekheviyê di ware maf



www.arsivakurd.org

de ji ziman û çand û xwendina sereta û hunerê gelêrî û danîna van xalan di pirogiramê dewletê de û di pirojeyê wê yên hînkirinê de , û rêdana çapkirina belavokên wêjeyî yên kurdî ( kovar , pirtûk , rojname .. t.d ) , û nîşankirina demekê ji bo belavkirina û ragihandina radiyo û telifizyonê bi zimanê kurdî .
û li ser roniya vî pirogiramê siyasî partiya me alîkarbû di civandin û daneheva tevgera kurdî li sûrî , û Partiya me derbasî çarçewa ( Hevbendiya Dîmoqrata Kurdî li Sûriya ) bû , û wilo jî beşdarbû di avakirina ( Komîta Hevbeş ya Hevbendî û Aniyê ) de ku di hundurê wê de niha ( 7 ) Partiyên kurdî cî girtine ku bi hevre laşê serkî ji tevgera kurdî li sûrî bi kartînin , û evan partiyan bi hevre di nav xwe de li ser yek nerîna hevbeş li hevkirin ji bo çareser kirina pirsgirêka kurdî li sûrî bi şêwekî dîmoqratî dadewerî .
û di vî warî bi xwe de , Prtiya me alîkarbû li kêlek wan Partiyan û bi hevbeşiya hêzên dîmoqratî yên ereb û asûrî yên ji dervî rêcîmê , ji bo avakirina çarçewa ( Daxwiyaniya Şam ), wek çarçewk niştimanî giştî ji bo pêkanîna guhertina dîmoqratî aştî li welat li ser van bingehan :
- pêkanîna sazûmanek niştimanî dîmoqratî ku bibe dergehek bingehî di pirojeya guhertin û sazkirina siyasî de , û dive ev guhertin bi şêwekî aştî û bi qûnaxan be û avakirî be li ser bingeha lihevkirinê .

- pirotistokirina ramyarên diktatorî û yekane , û qutbirî bi hemi pirojeyên tunekirin re .
- bawerî bi dîmoqratiyê wek sazmanek nûjen û xwedî bingehek cîhanî ,  û di avabibe li ser baweriyên serbestî û azadiya milet û dewleta dezgehî û guhertina desthilatê di riya helbijartinên serbest û berdewam da ku rê li ber milet vebe ku desthilatê binerixîne û bide guhertin .
- parastina serbestiya hemi kes û komel û kêmnetewan di xwepênasîna ragihandinê de .
- çareserkirina pirsgirêka kurdî li sûrî bi şêwekî dîmoqratî û dadgeyî , ku wekheviyê bi temamî ji hemwelatiyên kurd yên sûrî re bi parêze mina hemwelatiyên din ji alê mafên nasname û çand û hînbûna zimanê netewî û mafên din yên destûrî û siyasî û civakî û yasayî , li ser bingeha yekîtiya sûrî di warê gel û qadê de , û dive ku nasname û mafên hemwelatiyê vegere li wan kesan ku ji wan hatine sitandin , û girtina deriyê vê doseyê bi yekcarî re ,
- pêkanîna azadiyên giştî , û sazkirina jiyana siyasî di riya yasayek nûjen ji partiyan re , û sazkirina ragiyandin û hilbijartinan li gor yasayên nûjen ku azadî û wekheviyê peydabike ji herkesî re .
suleymanî : 14.6.2007

www.arsivakurd.org

# RÎPORTACEK LI SER FISTÎVALA PARTIYA DÎMOQRATA PÊŞVERÛ KURDÎ LI SÛRIYA DI BÎRANÎNAYOBÎLA WÊ YA ZÊRÎN

**ji çalakiyên ku Partiya me ya Dîmoqratî Pêşverû Kurdî li Sûrî kiribû di bîranîna yobîla zîrîn ya damezrandina xwe de , nûsîngeha partia me li herêma Kurdistan ( suleymaniyê ) hin çalakî kirin , ji wan çalakiyan :di se et( 4 ) li pişt nîvro ji roja pêncşemê ( 14.62007 ) an , kongirekî rojnamevanî li darxist di holî kongiran de li otêla ( suleymanî pelas ) , glek nûner û peyamenêrên dezgeyên ragihandinê yên ( telîviziyon , radiyo , rojname ) an , heval Elî Şemdin : endamê komîta navendî ya ( P.D.P.K.S ) daxwiyaniya xwe ya bi vê bîranînê di destpêka kongir de xwend , û dûre bersiva pirsên rojnamevanan û kenalên ragihandinê yên Erebî û Kurdî dabû ..**

**û li dû kongirê rojnamevanî fistîvalek gotarbêjî hate li darxistin di wê holê bi xwe de , û şahiyê bi kelêîkek bê deng dest pêkir li ser cane nemirên kur û kurdistanê , êdî gotin û birûskên ku hatibûn fistîvalê di vê bîranînê de hatin xwendin , û dinavre jî girûpek ji xebatkerên pêşeng ku piştgîrî û alîkariya partiya me kiribûn ji damezrandinê ve ta îro hatin xelat**

**kirin ..**

**gelek beşdarî vê ahengê bûbûn ji nûner û şandeyên partî û hukûmî û ji kesên naskirî yên kurdî û kurdistanî , û gelek dezgehên ragihandinî , û vaye li jêr naverûk :**

## PARTIYÊN KURDÎ Û KURDISTANÎ YÊN BEŞDAR DI FISTÎVALÊ DE LI SULEYMANIYÊ

**1- Yekîtî Niştimanî Kurdistan :**

**- Dr. Kemal Fuad ( serokê komîta kargir ya mekteba siyasî ya yekîtî niştimanî Kurdistan ).**

**- berêz Mele Bextiyar ( endamê komîta kargir ya mekteba siyasî û serokê nûsîngeha rêxistinên dîmoqratî di yekîtî niştimanî Kurdistan de ).**

**- berêz Emer Seyid Elî (endamê komîta kargir ya mekteba siyasî ya yekîtî niştimanî Kurdistan ).**

**- berêz Azad Cindiyanê ( berpirsê nûsîngeha ragihandina navendî ya yekîtî niştimanî Kurdistan ) .**

**- nûsîngeha pêwendiyên kurdistanî ya yekîtî niştimanî Kurdistan berêzan : ( Şadiman Mele Hesen , Şêx Tahir )**

**- berêz Serko ( cîgirê serokê nûsîngeha pêwendiyên derve yên yekîtî niştimanî kurdistan ).**

**- nûsîngeha sazûmana rêxistinî ya yekîtî niştimanî Kurdistan .**

**- berêz Hazim Yûsivî ( berpirsê nûsîngeha ya**

www.arsivakurdi.org

**yekîtî niştimanî kurdistan ).**
**2 - wefdê Partiya Sosiyalistî Dîmoqratî Kurdistan , bi serpereştiya berêz ( Hemê Hecî Mehmûd ) sekretêrê partiyê .**
**3- wefdek ji serkirdayetiya Partiya Şoreşgêranî Zehmetkêşanî Kurdistan - îran , bi serperwştiya berêz Ebdule Muhtedî sekretêrê komele .**
**4- wefdek ji serkirdayetiya Partiya Komonistî kurdistan - îraq .**
**5- wefdek ji serkirdayetiya Partiya Parêzgarên kurdistan - îraq .**
**6- wefdek ji serkirdayetiya Partiya Zehmetkêşanî Kurdistan - îraq .**
**7- wefdek ji serkirdayetiya Partî Dîmoqratî Kurdistan - îran ( PDK-Î ) , bi serpereştiya berêz Mihemed Nezîf endamî deftera siyasî .**
**8- wefdek ji serkirdayetiya Partiya Azadî Kurdistan - îran ( PAK ) , bi serpereştiya cîgirê serokê partiyê berêz Husên Yezdan Pene ..**
**9- wefdek ji serkirdayetiya Partiya Sosyalistî Kurdistan - turkiye ( PSK ) , bi serpereştiya berêz Nredîn Agirî endamê mekteba siyasî .**
**10- 3- wefdek ji serkirdayetiya Rêkeftina Dîmoqratî Kurdî Sûrî bi serpereştiya berêz Heciyê Efrînî endamê serkirdayeti yê .**
**11- wefdê nûsîngeha Hewlêr ya Partiya Dîmoqrata Kurdî li sûriya ( El-Partî ) .**
**12- wefdê nûsîngeha hewlêr ya Partiya yekîtiya Demoqratî Kurdî li sûriye .**
**13- Partiya Azadî Kurdî li Sûriye .**
**14- Partiya Çepê Kurd li Sûriye .**



www.....org

# KADIR Û KESÊN RÊVEBIR Û DESTHILAT Û SERBIXWE YÊN BEŞDAR

- Dr.Elî Se-îd ( serokê zangoya sulêmaniyê ).
- Lîwa-i Mihsin ( berpirsê pasporta ).
- siyasetmedarê bi nav û den berêz Selah Muhtedî .
- Pirofîsor Izedîn Mistefa Resûl .
- Kak Şoreş ( berpirsê telefizyona XAK ).
- berêz Mistefa Salih Kerîm ( cîgirê serok nûserên rojnama El-Itîhad ).
- berêz Cewher Kurmanc ( cîgirê sekretêrê giştî yê yekît niştimanî kurdistan di warê rewşenbîrî de ).
- dezga serdem ya rewşenbîrî .
- berîz Fetah zaxoyî ( wezîrê rewşenbîrî yî berê ) .
- berêz Mihemed Tewfîq ( berpirsê pêwendiyên kurdistanî yê berê ).
- siyasetmedar û rojnamevanê kurd Yûsiv Zozanî .
- berêz Celal Sam Axa ( berpirsê çavdîriya diravî ).
- berêz Mistefa Xoxê .
- Dr.Burhan Xefaf ( serokê beşê bingehî di kulîca çandinî de li zangoya suleymaniyê ).
- Mamoste Ferîdon ( Mamostê kîmiya zîndewî li zangoya suleymaniyê ) .
- berêz Cum-a Se-îd .
- roman-nivîsê kurd Mihemed Mukrî .
- berêz Hemîd Dostikî .
- berêz Ebdul Selam Cengo .
- nivîskar Fethula Huseynî .
- nivîskar Mihemed Hemo .
- rojnamevan Hozan Efrînî.
- berêz omîdar dildar ( rîxistina efû ya navdewletî ).
- berîz Hejar Raşid (rîxistina efû ya navdewletî)
- li gel komek ji dektor û mamosteyên zango û berpirsên hukûmî yên suleymaniyê .



www.arsivakurdi.org

## Rojnama Dema Nû

ji bo ( PDPKS )

**Li hember hemû meşeqet û astengiyên mezin 50 sal berê ji bo tekoşîna rizgariya gelê kurd we rêxistinek li darxist ew rêxistin heta îro jî bi şeref û serbilindî doza gelê xwe di domîne .**

**Em wek Rojnama Dema Nû , bîr û baweriya me bi partiya demoqrata pêşverû ya kurd li sûrî heye da ku di wê qonaxa ( pêvajo ) nazik de wê ji bo gelê xwe rolekî giring bilîze û erkên xweye dîrokî bi cî bîne .**

**Bi mebesta salvegera damezrandina vê partiya em wê pîroz dikin û serkeftinê dixwazin .**

**14.6.2007** **Rojnama Dema Nû**

## BIRÛSK Û NAMEYÊN KU GIHIŞTIBÛN FISTÎVALÊ

**1- birûskek ji berêz Hemîd Derwîş ( sekretêrê : P.D.P.K.S ).**
**2- Kak Mesûd Tek ( sekretêrê : PSK ).**
**3- Sînem Bedirxan .**
**4- evûqat Mistefa Ibrahêm ( berpirsê nûsîngeha hewlêr ya Partiya Dêmoqratî Kurdî li Sûriye - Elpartî ).**
**5- Partî Dîmoqratî Kurdistanî - bakur.**
**6- Partiya niştimanperwerên kurdistanî-turkiye.**

www.arsivakurd.org

**1- birûskek ji berêz Hemîd Derwîş ( sekretêrê : P.D.P.K.S ).**
**2- Kak Mesûd Tek ( sekretêrê : PSK ).**
**3- Sînem Bedirxan .**
**4- evûqat Mistefa Ibrahêm ( berpirsê nûsîngeha hewlêr ya Partiya Dêmoqratî Kurdî li Sûriye - Elpartî ).**
**5- Partî Dîmoqratî Kurdistanî - bakur.**
**6- Partiya niştimanperwerên kurdistanî-turkiye.**
**7- Rêkeftina Dîmoqratî Kurdî Sûrî .**
**8- Partiya Komonistî Kurdistanî - nûsîngeha suleymaniyê .**
**9- Partiya Zehmetkêşanî kurdistan - îraq .**
**10- Partî Sosiyalistî Dîmoqratî Kurdistanî-îraq.**
**11- Partiya Azadî Kurdistanî (PAK).**
**12- Partiya Parêzdaranî Kurdistan.**
**13- rojnama ( Dema Nû ).**
**14- rêxistina mosko ya ( PDPKS).**
**15- rêxistina okraniya ya ( PDPKS).**

## GOTINÊN PARTIYAN YÊN KU DI FISTÎVALÊDE HATIN XWENDIN

**1- Gotina Partiya me ya kû heval Elê Şemdîn ( endamê komîta navendî PDPKS).**
**2- Birûska Heval Hemîd Derwêş ji bo fistîvalê.**
**3- Gotina Yekîtiya Niştimanî Kurdistan , ji alî berêz Şadiman Mele Hesen ( endamê nûsîngeha pêwendiyên kurdistanî ) ve hat xwendin.**

www.arsivakurdi.org

**4- Gotina sekretêrê Komeley Şoreşgêrî Zehmetkêşanî Kurdistan , mamoste Ebdule Muhtedî xwend.**
**5- Gotina Partiya Dêmoqrata Kurdistan –îran , berêz Mihemed Nezêf Qadirî ( endamê deftera siyasî ) xwend.**
**6- Gotina Partiya Azadiya Kurdistan ( PAK ) , berêz Husên Yezdan Pena ( cîgirê serokê Partiyê ) xwend.**
**7- Gotina Partiya Dîmoqratî Kurdistanî –Îraq , berêz Rizgar Xefûr ( endamê komîta navendî ) xwend.**
**8- Gotina pirofîsor Izedîn Mistefa Resûl .**
**9- Gotina berêz Yşsiv Zozanî .**

## XELATKIRINA ÇEND XEBATKERÊN PÊŞENG

**1- Dr. Kemal Fûad :yê ku rolek wî giring di damezrandina tevgera xwendekarên kurdistanî de ya li ewrûpa de hebû , her wiha yek ji alîkar û piştgirên tevgera miletê me yê kurd li sûrî bû , û naskirî bû bi pêwendiyên xwe yên kûr bi serkirdayetiya Partiya me re û bi taybet bi heval Hemîd Derwîş re , û li ewrûpa rola serekî lîstibû di çapkirin û belavkirin pirtûka Mihemed Teleb Hilal ya kirêt her wiha di gihandina wê de bo aliyên pêwendîdar , ji ber vê yekê ew bi xwe di vê bîranînê de hêjaye xelatkirinê ye.**

## 2- pirofîsor Izedîn Mistefa Resûl

yê ku di pênciyên sedsaliya bûrî de li Sûriyê bû û bi mamoste Hemîd Derwîş û hevalên wî re beşdarî di damezrandina yeketiya xwendekarên kurd yên Sûriyê yên zanîngeja Dîmeşqî de kiribû herweha alîkarî û piştgêriya damezrandina partiya me kiri bû

3- Siyasetmedar û ragihandinvan Yûsif Zozanî: Zozanî di despêka damezrandina partiyê de tevî partiyê bibû herweha roleke giring di rêxistina xwendekarên partiyê ya Hesekê de lîsti bû û li were ma bû ta ku berê xwe da Ewrûpayê.

## çalakiyên rêxistina xwendekarên partiyê ya zanîngeha Silêmaniyê

1- ji bo xelatkirina xebat û rola wî û alîkariya wî ji damezrenerên partiyê yên pêşen re şandek ji rêxistina xwendekarên partiyê bi serdanekê çû parka xebatkar û siyasetmedarê kevin ( Ebdulrehman Zubeyhî ) û bi navê heval Hemîd Derwîş ew bi gurzek gul yê ku li ser pêkerê wî hat danîn xelat kir.

2- rêxistinê hijmarek ji xwendekarên Bakurê Kurdisrtanê yên ku li zanîngeha Hewlêrê dixwînin vexwandin bo fîstîvalê û kêfxweşî bi nasîn û beşdarbûna wan di yobîla zêrîn de kir .

3- belavokeke taybet bi fistîvalê bi herdû zareveyan ( Kumancî – Soranî ) herweha bi



www.arsivakurd.org

**zimanê Erebî jî ji aliyê rêxistinê ve hat belav kirin, di wê belavokê de daxuiyaniya partiyî ya ku di kongira rojnamevanî hatibû xwendin herweha gotina partiyê ya ku di fitîvalê de hatibû xwendin hati bû nivîsandin.**

**4- rêxistin bi karê belav kirina posterên 50 saliyê partiyê li bajarê Silêmaniyê rabû, herweha dawetnameyên fistîvalî ji aliyê rêxistinê ve hatin çapkirin.**



www.arsivakurdi.org

# Ji Şîretên Mîr Celadet Alî Bedirxan (Di 56 saliya koçkirina wî de)

Konê Reş

Wek ku diyare, di 15 tîrmehê de(2007), 56 sal di ser oxirkirina dawîn a mîr Celedet Alî Bedirxan re derbas dibe. û wek ku hûn tev dizanin di 15ê gulana îsal de jî, 75 sal di ser derçûna kovara wî Hawarê re derbas bûn.

Bi vê helkeftinê ez dixwazim careke din dewla xwe di bîra mîr Celedet Alî Bedirxan de dakim û kela xwe û kela tiyên ziman û rewşenbîriya kurdî a nûjen- Yê ku bixwaze - di vê havîna gerim de, bi qurtek ava sar û cemidî, ji ava bîra mîr Celedet Alî Bedirxan vexwim û xwe hênik bikin...

De werin em bi hev re li hin şîretên wî guhdarî bikin. Ez ti şirovekirinê ji dirêjkirinê re pêwîst nabînim û ez nabêjim ku di roja de, ji gelek rexan ve şerê mîr Celadet û Dr. Kamîran dibe..! Hema ev şîretên wî bi tena xwe xweş bersivin ji wan kesan re:

(…Dema ko tu dixebtî qet li dora xwe menihêre. Heke ên din dixebtin an ne. herçî ko dixebite karê xwe pêk tîne û karê tu kesî bi xebata yekî dîtir naçe serî. Her dar bi pelên xwe saye dare, ne bi pelên dara dorê.

Ew ne bi tenê ye. Di dora te de hinin din jî hene ko dixebtin. Heke te tiştek pek anî li dora xwe



www.arsivakurd.org

vedkire, lê tiştekî welê bigere ko bi yê te bêtir û tekûztir bit.

Hûn hemî ji bona avahiyekê dixebitin. Her kê ji we hîmê wê daniye xwedê jê razî bit.Pesin jêre bit, heqê wî ye. Hûn jî herin dar û qirş, herî û kevirî peyda bikin, dîwar an banekî wê çêkin. Nav didaniyê bidin. lê ne ko bidexsin.

* * *

Tu ketiye cînariya yekî ko avahiyek bi du mezelan aniye pê. Tu di xwe re wî xurtî di bînî ko bikarî avahiyekê çend tayîn û mezelên ber pê bikî. Lê avakirina mala mezin bi xerabkirina a kiçik dest pê meke.

Belê xorto! Di dewra xwe de kêm û zêde, kiçik mezin, civat, kom, civanokan dê bibînî. Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bit. Di her tiştî de, nemaze di karên nûdetspêkirî de, pir car kêmanî hene. Heke te ew kêmayî dîtin, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan bi edilînî. Hilweşandina stûnekê hêsaniye, huner di rastkirina stûna xuwar deye.

…Xorto ! Holê bixebite, an bi xwe çêke an arîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin. Lê heger tu nikarî bi xwe çêkî, ne jî arîkariya çêkiroxan bikî hingê bi ên çêkirî şa û kêfxweş bibe. Ji ber ko ew ji bona te , ji bona miletê te hatine çêkirin. Nav di wan de bide, wan bi pesinîne.

Xorto ! Te dît ko bazekî kevroşkek girtiye, mebêje , ma girtina kevroşkê jî tişteke. Lê bêje te xezalek girtiye. Ji bona ko baz li xezalê bigere û bide pey wê.



www.arsivakurdi.org

Xorto ! Min got heke tu nikarî çêkî, lê bawer bike, ewlebe ko te dil hebe tu ê bikarî jî. Herçî ko dixwaze di kare jî.

*        *        *

Wekî ko dixebtî dexisker ji dora te kêm nabin. Tu guh mede wan, gotinên wan damine(daneyne) ber dilê xwe.

Heke di riya xebata xwe de şemitî û ketî, tu zanî ewê çibikin. Mebêje ewê bên bi destê te bigirin, birînên te derman bikin. No; ewê ji hev dû bipirsin, gelo lingê wî ne şikyaye.

Bi xebata xwe bi nav û deng bibî. Xelkê qenc, xelkê welatparêz pesnê te bidin, tu ê giram bibî. Ên dexsok tu zanî dê çibikin ! Mebêje ko bo xelkê re çeplikan li te xin. No, dexis wan nahêle. Ewê bêjin: Ma ev çi kiriye, ji bona xwe xebitiye û bi nav û deng bûye, di her derê de pesnê wî didin. M a ev jî tişteke…

*        *        *

Xorto ! Herçî ko bi te berberiyê bikin ji te bêtirin. Ji xwe di dora gulekê de strî bi hezarî ne.

Ew di nav xwe de nexweş bibin, pev biçin jê, li te dibin yek, destên xwe didin hev. Ji ber ko ji te kêmtirin. Kêmaniya wan wan digihîne hev.

Ji xwe di tebîetê de jî welê ye. Tiştên qenc û hêja hindikin, nehêja û bêkêr zehfin. Ma tu nizanî ko di gundekî de du sê hespên kehêl hebin, di garana wî de bi sedan ga û çêlek û dewarên reş hene. Li nik xelkê gundî ne piraniya garanê, lê hindikayiya hespên kihêl bi qedir û hêjaye.

*        *        *

Her wekî min got tu guh mede wan. Her çî ko elîhdariya te dikin, li ber wan bikeve, ji wan mexeyide.ew peyayên nekerhatî û mivrone.

Nikarin, nizanin, ji lewra kurt û pist û gotûgota wan e.

*   *   *

Xorto ! Xebata te mîna dengekî ye. Ma deng bi pifkirinê tête vemirandin.
Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengî bi deng û pêjinê temirî ye.
Tu her bixebite, Qet mesekine, karê xwe biserxe.
Dengê te ko ji pifkirinê natirse, ewê her bilintir, çira te ko bi pêjinê na lerize ewê her geştir bit.

*   *   *

Keçê ! di van gotinan de para te ne hindike.
Keçê ! Tu keça wî camêrî, jina wî mirovî, diya wî xortî yê ko min şîretan lê kir û kar û xebata wî şanî we da.
Belê keçê, Ev xortê ha xortê te ye. Di mehdikê de te ew lorand. Di daweta wî de te jêre tilîland. Di roja qewimandinê de, te nav di wî da. Ji xwe tu birkê wî yî.
Keçê ! Min ji te divêt, tu xortê min welê bixwedî bikî û bigihînî ko li pesin û şabaşan sezabit û loma jê mebit.
Keçê ! Tu di her kar û diravî de arîkariya xortê minî. Tu ê pêre bijî, pêre jî bimirî).

Mîr Celadet Alî Bedirxan ( Kovara Hawar ê, H: 18 / 1933, Şam)
Konê Reş
Qamişlo 15/07/2007

www.arsivakurdi.org

# JIN JIYANE

**Fewaz Hesen**

**Gotina jin ji jiyanê hatiye ,û bi jinê jiyan berdewam dibe . rola jina Kurd di fêrbûna zimanê Kurdî de roleke sereke û bingehîn û pir giringe , her wisa piraniya berbariyê dikeve histiwê wê . ji ber ku zarok ji dayika xwe dibe û heyanî bîr dibe piraniya dan û stendina wî bi diya wî re ye. û di vê dema ku zarok dighêje vê qonaxê weke pend dibêje , mejiyê zarokan mîna rûpela sipiye tu çi tê de binivîse wê ew tê de bimîne.**

**Dema ku jina Kurd bi zaroka xwe re bi Kurdiya zelal û temîz bi axive , wî fêrî ziman bike bê guman ev zarok dema ku mezin bibe , wê giringiya zimanê xwe nas bike û wê karibe sûdakê li zimanê xwe bike , vî tiştî jî bighîne zarokên xwe û nifşên nûhatî û dijminên zimanê Kurdî destên wan naghê vî tiştî ku qedexe bikin , wê di rêyên dîtir re şerê zimanê Kurdî bikin û kar bikin ku ramanên jina Kurd biguherin û ramanên xwe di mejiyê wê de biçînin.**

**Ji alîkî din ve mixabin hin ji jinên Kurd dibêjin : çi giringiya zimanê Kurdî heye û şermê û paşketinekê tê de dibînin dema ku gotinên Kurdî yên resen û temîz yên bav û bapîran bi kar bînin .**

**Belê nayê jibîrkirin ku dijminê zimanê Kurdî , ji sedê salan û heyanî îro , şerê zimanê Kurdî dikin , û sedemin din jî hiştine ku rola jina Kurd di karê fêrbûna ziman de qels be , weke sitemkariya mêrê Kurd li ser jinê , û bi çavekî bi çûk li rola wê dinêre , û sedema vê sitemkariyê sitemkariya dijminên doza Kurde.**



www.arsivakurd.org

# ber bi roava de

**Alan Elî**

vê êvarê carek dî weke her êvar li wê derê rûnişt, xwe qermiçand û pala xwe da wî dîwarê kerr, lal û çav şeliqî. Her wiha ev bîst sal derbasbûn, lê îro ne wek her carê, dunya ber roava bû, û rokê jî tîrêjên kuştina xwe bi hêz dişandin. Sirek bayê sar dibariya û lîskek biçûk û mezin bi çara wê re dilîst. di nav tilîyên wê de ku bê rewş û nav mane çixareyek sor bû… wan tilîyan jî bi wê arîyê û sorbûnê re beşek ji ahîna wê dilorand. Tenê bû, ji bilî zarokekî biçûk pala xwe dabû destê wê yê çepê, te digot qey di himêza dayika xwe de ye.
bê deng mabû … li metka xwe dinerî, dihat xuyakirin ku ew jî dizane yan jî diheste bê çi di çavên vê pîrekê de diqewime, ewê jî her gav hinek arî dixist destê xwe û di avêt devê xwe de, dibere diranê wê yê zer û reş xuyadibûn.. lê ew diran hîn qîzbûn.
Li çûn û hatinê dinerî û xwe bi tirapêlka ber lingan ve dişuşt.. û avjenî dikir, wê bi xwe jî nizanîbû ku çi dike, ji bilî ramûsana ku dida wî zarokî û bi himêzkirina xwe jê re di nav baskên bêhna wî de xwe bi lorîneke sermedî dihejand.
bi nerîna çavên xweyî nezan.. pîr.. bêdeng û demûşî, xelk diweşandin û xwe jî di nav vê nenasiyê de wendadikir, dilerizî.. dikir qîrîn lê kesî dengê wê nedikir. tenê xeyala wê ew dibir derek xweş, dereke



www.arsivakurdi.org

**ku dikare destê xwe.. ruwê xwe.. mijankên xwe … ta pêsîrên xwe jî bi axê ve vemalîne.**
**di wê demê de tenê ew digihaşt can û heyîna xwe, xwe felat dikir ji vê tirapêlkê… ji vê pirikê… ji vê şêlûbêla dest û ling… û çavan ta bi ramanan.**
**Wek komek goşt û por.. li wê derê xuyadikir, dûrî miriya bû bi gotinekê… û nêzîkî saxa bû bi temenekî. Her ku derbasdibû tilîyê xwe.. canê xwe .. û navê xwe yê berê, destên wê li wî zarokî sistdibûn.. û wî jî xwe ji tilîyên wê yên mirî rêzgar dikir û qeflek ji şaxên ken di ruwê wî de şîndibûn. Ba li ruwê wê.. çara serî û porê wê yê sipî ku çend tayên sor û fedyok serê xwe di nav wan re derxistibûn dixist û ew belawela dikir. laşê wê jî berevajî diket canê wê, û herduwa bi hev re lîskek dîrokî dilîstin.**
**Tenê gotinekê di bîra wê de diçirisand..ew jî gotina apê wê bû berî bîst salan:**
**Keça min .. Sînem.. Emê te ji Salih re bixwazin, û tê bûka me be. ev gotina ha ew diperçiqand û hêsir bi ser rûkê wê yê bêrû de diherikand, ji ber vê derewa ji mêj de.. ev derewa ku laş û canê wê tevde kirin arî.. û ew bi ser hevde kir cûmaq.. û mirovaniya wê avêt dera han. Lê wêneyên qirşik, pembo.. û pirêzeyan ji ber çavên wê ne diçûn…**
**cardî ba radibû.. û derpêyê wê xwe li lingê wê digerand..**
**metkê.. metkê…..**

**….. rok çû ava .**

**Hesekê / 23.4.2007**

www.arsivakurd.org

# di baskokirina xewnan de

*Mehmûd Badilî*

gelek cara, bavê Loman jê re digot: kurê min li min binere.. li rewşa min, li karê min, ev karê ku ji sibehê ta bi êvarê serê min ji erdê ranabe, ku ji ber çogerî bûme, û jê pêve nikarim tu karê din bikim .. kurê min tenê li min binere, îca tu çi dike bike, ya giring ku tu binerî, lê tu çawa bibînî ne xeme, tu çawa fêmbikî dîsa ne xeme, tenê dema tu dixwînî bera wêneya min li ber çavê te bî, ji bîrmeke ku bavê te çimkî bê xwendine bi kêrî pîvazek tûj nayê, û çi kesên ne xwende jî wihane …"



dêya wî jî her êvar berî ku razê li ber balîfa wî rûdinişt, serê wî dipeland, destê xwe di nav porê wî de dibir û tanî, anîya wî maç dikir, digot: dêya te li dora te bigere, qurbana serê Lomanê xwe bibim, tu ji xwendinê westîyayî ye kurê min, xwendin zêrê zere, xwedê bêje erê wê destê te zêr bibire law, tê bibe tiştek, tê bi nav û deng bibe, û wê bira û ap û pismam û birazîyên te tevde li ber destê te bigerin, de razê lawkê min razê, xwedê keda te li erdê nexe kurê min..".

Loman bi bêdengî peyva dê û bavê xwe werdigirt , peyvên wan dixist serê xwe, lê herdem li nav şagirtan ji ber hejarî û xizanîya malbata xwe bi kêmbûna kesayetîya xwe hestdibû, xwe kêm didît, gelek caran xercîya wî tunebû, lê her êvar dema diya wî wilo li ber serê wî rûdinişt, bêhna wî bi wan



www.arsivakurd.org

**peyvan firehdibû, lê dima di hindirê xwe de diqiçqiçî, dikizkizî, li ser xewna ku bigihêje asta xwendinek bilind û pera di bêrîka xwe de bibîne, di xew re diçû..**

**Nav û dengê Loman li herêmê tevî belav bûbû, ku xortekî jîr û jêhatîye, di dibistanê de yê yekem li ser hevalê xwe derdikeve,qonaxa seretayî û ya navincî û deh û yazdeh bi vî rengî derbaskir û niha di bakelorya de ye, heyvek maye ji ezmûnê re, berî roj derkeve radibe dixwîne ta se'et duwazdê nîvê şevê , bi kotekî diya wî pertûkê ji dest digire, ta ku razê..**

**Li gund xortekî din heye, ew jî bi Loman re dixwîne, ji malbateke pir zengîne, lê di xwendina xwe de pir qelse, her sal bi zorê xwe derdixist, lê îsal li pêş ezmûneke dijware, roj têt nîvro nuh ji xew şiyardibe, porê xwe dişo, cêl dike, cilê xweşik li xwe dike, û derdikeve nav gund tolazîyê xwe dike, yan pertûka xwe dixe destê xwe û dikeve kezeba rê de, tenê ji bo xelk bêjin va lawê Evdî jî dixwîne, roj bi roj ezmûn nêzîkdibe, dem jî wek çeme, li hevalê xwe napirse, û çi gava Loman û Cemîl pêrgî hevdibin, her yek ji yê din dipirse ka tu gihaştiye kûderê.**

**Loman bûye cara sisyan li pertûkan vedigere, Cemîl qerfê xwe bi wî dike, û jê re dibêje nizanim tê bibe çi loo, hahahaha.. qey tê li bavê xwe derkeve .. tê jî bibe hostayê lêkirinê..muhendis.. tiktiktik..hahahaha..**

**Loman serê xwe bera ber xwe dide û ji cem dimeşe, di dilê xwe de dibêje ezê bibim endezyar û serê te û bavê te jî bişkînim.**

**piştî Cemîl naskir ku Loman gelek cara keresteyên xwe temamkiriye, hiş di serî de nedima, tebatî nema**



www.arsivakurd.org

**dihate wî, wek yê ku îsot têde be, nema dizane çi bike, û her carê ji xwe re dibêje qet çênabe, ev siqilkê ha, lawê sabûn bideyno, cil rizîyayo, kabok kerimyo, têkeve pêşîya min, yan bibe tiştek, û ez, ez lawê Evdî axa, yê xwedî pazdeh hezar donim erd, û tirumbêl û terektor û derase û bîrên Irtwazî û koşk û dikan û nav.. divê ez xwe bijdînim.. yan hawakî bikim ta ku nehêlim ev siqilk bi serkeve. wilo gef li Loman dixwar, nemaze piştî ew xewna giran ku bi şev pêde nehiştibû çavê wî bê ser hev ku xwe didît karkerekî piştxûz û li ber destê endezyar Loman xizmet dikir .**

**Cemîl bi hemû karîn û hêza xwe diramîya, da ku çareyekê ji bobelata ku bi serê wî ve hatiye bibîne, ezmûn nêzîk dibe, di nav gotinê pertûkê de, egala bavê xwe xwar dibîne, payebûna diya xwe li pêş jinên gund birîndar dibîne, ruwê xwe li pêş keç û yarik û dostên xwe reş dibîne, ditengije, ji xwe re dibêje: niza ezê çi bikim ji vê xwendinê, yan xwendin wê çi di min de biguhere, çi li min zêde bike, û nizanim ji bo çi û di ber çi de ez xwe wilo diêşînim..?. pêhna xwe li pertûkê dixe, pênûsê dişkîne, tiştek ji razanê xweştir nîne…**

**Lê ewê çawa razê, vitevit di nava wî deye, lê herdem peyva ku bavê wî carekê jê re gotibû, ber dilê wî xweşdike, ew soza pê re kir ku bes bekelorya derxe dê wî derxîne jidervî welêt ta ku nûjdarîyê bixwîne. Ezmûn nêzîk dibe, xwendin bi Loman xweşdibe, lê li ber çavê Cemîl reş bûye, ne tenê xwendin, belê av û xwarin û danûstandina di hindirê malê de jî, dêya Cemîl bi wî hest bûye ku rewşa kurê wê ne siruştîye,**



www.arsivakurd.org

**Cemîl ne yê berêye, ji keça xwe naskir ku Cemîl tiştek nexwendiye.**

**Êvarî di nav nivînan de xwe ji Evdîyê xwe re kir wek bûka yekşevî, sîng û pişt û nav lingê wî tevda, serê wî xist nav cotê memikên xwe, Evdî germ bû, damarê laş tev lê rabûn, cara yekeme ku herdû xwe şilfî tazî bi hev re dibînin, cara yekeme ku Fato xwe bi vî rengî jêre amade dike, û doza livînê lê dike, Çimkî Fato jê heznedikir, ji bêhna wî direvîya, digel ku bûbû dêya bênc zarokan jî, lê hîn hezkirina wê ya pêşîn ji dil derneketibû, hezkirina ew xortê bejin zirav yê taxa wan di dil û canê wê de dima, loma her carê digot xwedê ji te nerazî be Evdî, te bi perê xwe ez kirim jina xwe, bi perê xwe te devê bavê min girêda..**

**Piştî ku Evdî baş germbû, xirpişî ser sînga Fato, cara yekê ye herdû jin û mêr bi hev re germ dibin, bi hev şêrîn dibin, bi cêja laşê hev hest dibin.. tîna arezûyên xwe şikandin, rabû fato jê re got: Evdî, kurê me roj bi roj zirav dirêse, pertûkên xwe tevde nexwendine, ezmûn jî nêzîk bûye, divê tu çareyekê ji vî lawkî re bibîne ta ku neseqite, Evdî jî soz da wê ku ezê bihêlim wek firek av bekelorya derxîne, ma ev pere ji bo çine Fato..**

**Fato jî serê sibehê rabû, laşê xwe ji bêhn û girêza Evdî şuşt, lê dilê wê bi peyva Evdî nerastbû, bangî keça xwe kir, û jê re li ser jêhatîbûna Loman Axivî, pesnê jîrbûna wî da, keç jî pir kêfxweş dibû bi van peyvan, wek ku jê re nîşaneya kesk vêkeve ta ku here tîkilîyan bi wî re çêke, yek nekir dudo berê xwe da mala Loman, bela xwe têve dida, keçikê bi rastî jê hezdikir, bi se'eta li ber bêhna wî dima, ta**



www.arsivakurdi.org

radeyekê di hişt ku bi şev jî pêrgî wê bibe, di qozîkê xanîyan de, di lodê kayê de, di xanîkê pez de, tu der li gund nema û maç û tevdan û tazîbûna Loman û Dilşa nedîtin, bêhna hezkirina wan li nav xelkê gund belabû, dengê wan derket, bav û dêya Loman jî pê dihisiyan ku kurê wan ketiye tora çi keçê, û çi malê .. ji hev re digotin: ev porkura ha, lawkê me ji rê bir, ji serê çend rojan ve nema devê pertûkê vedike.. Ezmûn niha li dare, Loman her ji keresteyekê derdikeve, wek yê ku avjenîyê bike, cil û laşê wî di xwêdanê de dimîne, pirsan dixwîne wek tu caran pê nebîhistbe, li nav hev dixe, gelek caran nizane çi dinivîsîne, navê Dilşa pê re têt nivîsandin, mija evîna wê nahêle ku tiştek bê bîra wî.. û Cemîl bê xem diçe ser ezmûnê, xwe bi raçêta dixemilîne, bê xem derdikeve, çavnêrên navindê tevde wî nasdikin, gelek caran pertûk jê re derbasdikin holê (qa'ê).. wiha ezmûn bi dawî bû, lê evîna Loman û Dilşa pêtir deng dida, roj bi roj kûrtir dibû, bêtir ji berê pêrgî hev dibûn, sê salan li ser hev Loman bekelorya derdixist, lê mixabin elametên wî hindik bûn, ne dibû alîkar bo xwendina zankoyê, dawîyê xwe di enstîtuya Erebî ya mamostayan de tomarkir, lê ne bi dilê wî bû, ji alîkî dinê jî ber dilê xwe xweşdikir, ku enstîtuyî nahêle ji bajêr bi dûr keve, û perê bavê wî tuneye ku li bajarên dûr bixwîne, her ew ê nêzîkî Dilşa xwe be jî. Hêdî hêdî Loman ji xwendina li enstîtuyê hezdikir, hema sala pêşîn yê yekem li ser hevalê xwe derdiket.. dîsa nav û dengê wî li nav mamostayan belav bûbû..

Loman nîşaneyên (elametên) xwe pêş bavê xwe kirin, bav serê xwe hejand û di ber xwe de got:



www.arsivakurd.org

**"xwelî li serê te be, ew gemjeyê ha , yê ku tîp ji hev nasnedikirin wa bû textorê diranan, û tu bi van nîşaneyan serê xwe mezin dike.."**
**di sala dudwan de ji xwendinê û berî ezmûn destpêbike bi heftîkê, biryara berdana Loman derket ji enstîtuyê, çuqasî Loman di berxwe de da û xelk şandin ser kargêrê enstîtuyê lê ew venegerandin, Loman bê çare ma, bê kar û bê xwendin, jiyan tev li ber çavê wî reşbû, dilsar mabû ji her tiştî, roj bi roj zirav dirist, parîyê nên nema di qirika wî de diçû xwarê, nema dilê wî dibijiya tiştekî. Dilşa jî ew keça ku ji bo wê xwendina xwe li ser kir, nema dixwest lê binere, gava xwazgînîyê wê hatin û qelenê wê birrîn, li cem Loman wek ku tiştek çênebûye, wek ku ne yara wî be, ne ew keça ku gelek caran di tarîyê de laşê wê li laşê wî banîyabû, ku bêhna wan tevlaşî hev bûbûn, wek ku wê nas nake, lê her kêlîkê dehê cara di hindirê xwe de digiriya, dikir qêrîn, diponijî, xwezîya xwe dicût, poşmanî bi destarê neçarîyê dihêra, payîzê xwe berdida valahiya derûna wî, û bêhêvîyê li kembera xewnên wî xwe dipêça, her ku wê kelpîçek bida destê bavê xwe jê re digot: aniha ev lêkirin ji bo çi ye ..? ! welatê ku mirov ji xwendinê bêpar dikin, welatê ku xewnê yekî têde naçe serî, welatê ku parîyê nên di devê mirov de dike quzelqurt, bi xwedêke ev çi avakirine tu têde dike, û xelk çawa dilê wan heye ku xanîyan ava bikin, her kelpîçek dida destê bavê xwe, diramiya ku xwe di xênî de werke, û ji vî welatê ha yê ku roj bi roj wî pûç dike xwe felat bike .**



www.arsivakurd.org

# Mizgefta Sor

berhevkirin :**Şiyar Silêman**

…… ji devê Bavê Kawa

Li Cizîra botan zilamek hebû bi navê *Derwêşê Fana* , zilamekî gir û mêr û zana bû ,dibêjin dema li hespê siwar dibû , pişta hespê di bin giraniya laşê wî de ditewiya ,navê wî gelek dengdabû li bajarê Cizîrê .Rojekê ji rojan xanima mîrê botan ji mîr pirsî : ev demeke ez gelekî navê Derwêşê Fana dibhîzim , xelkê Cizîrê zor behsa wî dikin ,gelo ev kiye ev ê bi nav û deng bûye .. ? ji min re bûye mereq ko ez wî bibînim , mîr ji jina xwe re got : ser sera û ser çava ,wê daxwaza te nêzîk bi cih bê ,dibêjin mîr delêlî berdane nav bajarê Cizîrê , ko mîr dixwaze zilamên Cizîrê di ber pencera qesra wî re derbasbin , û kes li mala xwe namîne ,dibêjin her kes hat û derbas bû ta giha Derwêşê Fana, mîr ji pîreka xwe re got : eve Derwêşê Fana ,deng çû Derwêşê Fana û gote hevalê xwe : ev kar hemî ji ber mîr dixwest me şanî pîreka xwe bide , gelo mêrên Cizîrê karek wan tineye ji bilî mîr û jina xwe wensa xwe bi wan bînin..? ez bi Xwedêkim eger min zanîba ji ber wiloye ez nedihatm , mîr dengê wî kir , pir zivêr bû û qeherî , şand pey Derwêşê Fana û jê re got : divê tu ji Cizîrê derkeve yan jî ezê serê te jêkim ,



www.alsvakurd.org

Derwêş ê Fana gote mîr :belê ez xulam , emrê te li ser sera û ser çava ,Derwêşê Fana xwînî bû û çû Rawendûzê , hesp û şûr û cilê xwe danîn cem yê xançî û jê re got: ev ê bi emanetî li cem te bin , û deh zêr jî dane wî kirya parastina emanetên wî ,Derwêşê Fana her roj diçe oda mîrê Rawendûzê , li nav xulam û xizmetkaran li dawiya zilaman dirûne ,dibêjin mîrê Tebrîzê û ê Rawendûzê dijminê hev bûn , gelek şer di navbera wan de çêbibûn , rojekê mîrê Rawendûzê gote xulaman : herin xwarina Eǵîda li dîwana min li nav siwaran bigerînin ,dema xwarina Eǵîda dianîn hingî xelkê dizanîn ku şer heye ,xulama pariyê Eǵîda anîn danîn ser sifriyê li ber siwaran tevan gerandin kesî ne rahiştiyê , dema giha pêşya Derwêşê Fana rahişte hemî pariyan û xwarin ,dibên dîwan û mîr tevde matmayî man, go siwar nikarin parîkî bixun evî tev xwarin , mîr gote Derwêşê Fana : tu zane ev ji boy çine ? got: belê ezbenî ez zanim … tu berê min bide kûderê ez amademe… bi şev herkes çû mala xwe û Derwêş li hêvya sibê ye ku karê xwe û çûna şer bike , nîva şevê tilya Derwêşê Fana mûmarî bû ,wê şevê ji êşa diçû û dihat , xew bi çavan neket , mîr ew di wî halî de dît , Derwêş agahdarbû ku mîr ew di wî halî de dîtiye , ji fihêtiya û şermiya ku mîr bêje ev mêr ji ber êşa tiliyê evqasî li ber xwe dide , rabû çavek xwe peqand ji bo ji mîr re bêje : ez ji ber êşa çavê xwe ranedizam û diçûm û dihatim ,şev çû û sibeh hat mîr got Derwêşê Fana : şevê dî sedema ne



www.arsivakurd.org

razana te çibû , derwêş got : mîrê min birûsk ketibû çavê min û peqand , ji ber wilo ez ranezam ,mîr got : min go qey tiliya te mûmarî bûye .

paş re Derwêşê Fana çû cem ê Xançî hesp û şûr û cilên xwe anîn û gote mîrê Rawendûzê : ez amademe herim şerê Tebrîzê , Derwêş di gel hêzek siwaran çûn şer , bi mêranî cengek beranî kir û bi şûrê xwe serî difirandin mîna bazê têkeve nav refê qitka de , dawî mîrê Tebrîzê şikest û Derwêşê Fana kelha Tebrîzê xiste bin destê xwe de ,dema vegerya Rawendûzê dergehê kelha Tebrîzê ji berkir û bir ji mîrê Rawendûzê re ,Dema mîrê Rawendûzê lehengiya Derwêş û serkeftina wî dît , ewî nema zanîbû vê qenciya wî çawa vegerîne ,mîr got : Derwêş .. ti çi bixwaze ez li ber te amade me , te zêr divên , jin divên , bê du dilî bixwaze…..Derwêş got : mîrê min ez tiştekî naxwazim lê tenê ez dixwazim ti şûrê min seqa bike , ew dizane ku ne li Cizîra Bota be şûr nayên seqakirin , mîr daxwaza wî pêk anî , çar siwar amade kirin ji bo çûna Cizîra Botan û seqakirina şûrê Derwêş , berî bi rêkevin Derwêş gote wan : dema hûn bighên Cizîrê , hûn ê şûrê min di mizgeftê de bi stirihê pezkovî ve daliqînin ,dema mîr bê nimêja sibê wê şûrê min bibîne û ew ê qîrekê bide û wê bêje ev kê ev şûr aniye vir , hûn dernekevin ta ew bext nedî we ,dema bext da we , hûn ê derkevin û bêjin Derwêşê Fana ev şûr şandiye ji bo seqakirinê ,Ewan siwaran ew gotin tev bi cih anîn ,dema mîrê Bota ev bûyer dît ,



www.arsivakurd.org

naskir ku Derwêşê Fana dixwaze vegere Cizîrê ,ji wan re got : min li Derwêşê Fana bûrî û bila vegere bajarê xwe , her çar siwar vegeryan û ew serpêhatî ji mîrê Rawendûzê re gotin , mîr ji Derwêş pirsî :çima mîrê Botan te derbeder kir ? Derrwêş got : ji ber zilamê Cizîrê tev bi çar guna bûn lê ez tenê bi sê guna bûm , ji ber wilo ez derbeder kirim , bi angoya ku bêje , ez kêmê zilamê Cizîra Bota me ,mîr jê re got : ma mirov mêrê wekî te derbeder dike..? Derwêş got : mîrê min vaye mîrê Botan li min buhurtiye û ez dixwazim vegerim bajarê xwe , eger destûra te hebe ,mîr got : Derwêş…. Rawendûz jî bajarê te ye û em serbilindin bi mana te di nav me de , lê daxwaza te çi be tu azade ,lê dema tu here Cizîra Bota tê dergehê kelha Tebrîzê bi xwe re bibe , ji ber ew sîmbol û nîşana mêraniya te ye ,Derwêş çû Cizîrê û mîrê Rawendûzê ew dergeh jî pê re şand li ser millê heşt zilaman , ew dergehê sor bi xwînê li ber mizgefta Cizîrê dan , ji ber ew dergeh bi xwîn-rijandinê hatiye , navê mizgefta Cizîrê bû Mizgefta Sor , û ta roja îro ew dergeh li ber wê mizgeftê ye , hêjayî gotinê ye ku Mizgefta Sor di dema xwe de beramberî mizgefta Ezher li Misrê bû sebaretî zanîna oldarî û ayînî , û pirê zana yên wê demê derçûyên Mizgefta Sor bûn ,yek ji wan helbestvanê bi nav û deng Melayê Cizîrî , ku gora wî jî di bin wê mizgeftê de ye , ji lewra Mizgefta Sor mizgefta herî bi nav û denge li Cizîra Botan .



www.a...kurd.org

# Cindoyê gavan

Bavê serbest

Gênc Axa dil kete Sosê qîza Cindoyê gavan û ew mar kir ango ji xwe re kire bermalî , piştî dema salekê bêtir kurek jêre çêbû , Gênc Axa kete gumana û poşman bû ,çawa ez Axa qîza gavanekî bînim ?! û bibe ber malya min , lê ya girantir zarwê ku jê bibin wê ew jî bêhişbin weke xalê xweyî gavan . min çi kir ji serê xwe , divê ez vê jinê berdim lê çawa ?

Çi mehnê ezê lê bigrim ta ku ez wê berdim , çend roja wilo mijûl ma û darikê xwe di nav axê dide , jina wî Sosê jêre got : çi heye Axa tu van roja gelekî mijûle û tevgera te ne wek demê berê geşe û tu nema li alyê min dizîvire , ka derdê xwe ji min re bêje delalê min , Axa derdê xwe ji jina xwere got , ez ditirsim ku dûndê min ewjî mîna kalkê xweyî gavan bê hişbin , Sosê got : na delalê min tu şaşe , bavê min raste bi karê xwe gavane lê bi hişê xwe rêzane , Gênc Axa jêre got başe ezê çar pirsa bi tere jêre bişînim bera bersivê wan bide, wê çaxê emê nas bikin ku bavê te gavane an jî rêzane,Sosê got de ka pirsê xwe bêje Gênc Axa got pirsê min evin :

1- xwarina gellekî xweş li cîhanê çiye ?

goştê yemilka ye an yê karê şemzeye yan hingive çiye?



www.arsivakurd.org

Gênc Axa pirsê dike û bersiveke şaş pêre dibêje ta ku Sosê wan bersivê şaş ji bavê xwe re bêje û dîsa vegerîne

2- kincê xweşik û baş li cîhanê kîjanin ? gelo hevirmêşe hirîye kitane çiye ?

3-tiştê giran di cîhanê de çiye ? hesine tûnce ango zêre

4- welatê xweş û baş li vê cîhanê kîjane ? Şame ,Baxê dado ye( Bexdad) , Mekeye ,Mmedîneye li kûye ?

Sosê bi dilekî xweş û geş pirs birin û di dilê xwe de dibêje ez bersiva jî ji bîr nakim ,ezê wan jî ji bavê xwe re bêjim , piştî ku Sosê pirs û ew bersivê şaş ji bavê xwe re gotin , Cindo serê xwe hejand : na na , keça min ev bersiv şaşin ,raste demê xerab belengaziyê, xizaniyê hişte ku bavê te bibe gavan lê dibî ku kurê wî bibe sermiyan , çerxa cîhanê wisa ye , geh li jore geh li jêre,lê divê mirov bê hêvî nebe,here keça min,ji mêrê xweyî Axa re bêje bersivê pirsê wî evin

1- xwarina xweş ewe ya ku hebî û mirov karibe bîne , bapîrê me Kurda digotin zikî têr be bera ji qaşilî dêr be

2- kincê baş ewin ku mirov karibe bikire ta xwe bi parêze ji germa havînê û serma zivistanê , raste hevirmêş , hirî,kitan başe lê ger nebî ji çi re ye Kurda digot : menêre li mikûs binêre li mirûs

….

1- tiştê giran li vê cîhanê mêjiye ,hişe ew bû yê ku hesin çêkir û qonax ava kirin ,(top, teng, firok )
bapîrê me kurdan ji jina bêhiş re digotin reng xezale lê xerab male
2- welatê xweş ewe cihê ku mirov lê ji dayik bûbe û bapîrê me jiyana xwe li ser bûrandine ,xebat û kar tê de kirine
kurd dibêjin Şam şekire lê welat jê şêrîn tire

şêranya welat

Welatê min pir şêrîn
Ji bo wî bûm dil birîn
Me têde da gelek zîn
Bang û hawar û qîrîn

****

Ger ne xweş û kerbeş be
Hamûn û tehte beş be
Wek dojeh gelkî reş be
Bimin ronak û şêrîn

****

Raste dibêjine Şam
Li ser wê mij û xemam
Yê ku bighê diçe dam
Lê ji bo min nezêrîn

****

Ji xaka xwe hez dikim
Rû û lêva gez dikim
Berbi pêde lezdikim
Bi gav û pê û erîn



www.arsivakurdi.org

****

Warê bav û bapîra
Xwedan rol û tevdîra
Ser wan vêxin nedîra
Li Zagros û li Hemrîn

****

Di mêjûwê de gernas
Be bingeh û bi asas
Ji Şingal ta bê Sîwas
Li ser bû ceng û gurîn

****

Ez Nadim nadim nadim
Welatê xwe bernadim
Hustê neyara badim
Bi hêrs û ar û rivîn

www.arsivakurdi.org

# ÇEND DÛRIK JI FOLKORÊ KURDÎ
# BORBOR, LO'ERDIKO, MEYREMÊ

BEREVKIRIN Û LÊKOLÎNA
SALIHÊ HEYDO



Xwênerên hêja û delal : ev hersî dûrikên ku me li jêr nivîsandine ji folklore meyî zengîn û têre, her yek ji wan bûyerekê yan tiştekî taybet destnîşan û ber bi çav dike, dûrika pêşî ku bi navê Borbore, Evaya di ber dîlan û govendê re yan jî dirojên cejin û şahiyên rojên cejnên qurban û rojyê de keçikên kurdan digotin, çaxê ku ji xwe re hêlan çêdikirin lê dûrik bi xwe li ser bûkê hatiye afrandin, çaxê xêlî dihatin û ew bi hespê dibirin û diguhestin û ji ber çavê dê û bav û bira û xuşik û xalê wê dixistin ber bi cihekî dûr, rewşa xizim û kinêzên bûkê û şewtandina dil û hinavê wan têde tê zimên lê belê ew hespê yan jî ew mihîna ku bûk lêdikirin û pê dibirin ew bi boraqa pêximber dinimandin, rewşen û ruhniya xwedê û pêximber bi ser de barandine, dûrik keçek zane yan jineke dûrikbêj dibêje û koma keç û jinan lê vedgerînin, ev dûrik taybetî û xesyetê ji keç û jinaye :

## BORBOR(1)

Bor hatiye'j kulekê borbor
Şewqê daye doşekê borbor



www.arsivakurdi.org

Şewtandî dilkê kekê borbor

Bor hatiye'j hewşê yo borbor
Şewqê daye merşê yo borbor
Şewtandî  dilkê dêyo borbor

Bor hatiyê nav mala borbor
Şewqê daye xirxala borbor
Şewtandî  dikê xala borbor

Bor  hatiye'j   anîşkê   borbor
Şewqa xwe  daye îşkê borbor
Şewtandî dikê xwîşkê borbor

Bor  hatiye'j ezmana borbor
Şewqê daye mircana borbor
Şewtand  dilkê cîran borbor

Bor hatiye  te çidivê borbor
Mihînê êmê xwe'dvê borbor
Xalê  xelata xwe'dvê borbor

Zave dergîsya xwe'dvê borbor
Xesûyê  bûka  xwe'dvê borbor
Devçî  şabaşa  xwe'dvê borbor

Ev dûrika dîtir bi navê Erdiko tê gotin di karê çandinî û çinîna rezan de yan di tevirdaqna zevî û pel û pincêr û zêrzewatan de, di vê dûrikê de dîsa keç dibêjin û pê serhevde û kêmayê tînin ser xortê bê yar û kesê bê jin çimkî xwe nîşandan û raçavkirin didin ji xorta re, û xort hîç tu baxê biwan nakin di wî hingî de keçik zivêr û kiz dibin û dûrika



www.arsivakurdi.org

xwe li ser wa xortan berdewam dikin û dibêjin keçek dibêje û yên dîtir lê vedigerînin :

## Lo Erdiko

Lo Erdiko beyaro
Çola xwedê beyaro
Min lê çandî xiyaro
Te lê çandî xiyaro
Xeynî vanêl vê derê
Xwelîl kesê bê yaro

Lo Erdiko repino
Çola xwedê repino
Min lê çandî tûtino
Te lê çandî tûtino
Xeynî vanêl vê derê
Xwelîl kesê bê jino

Lo Erdiko hindiko
Çola xwedê hindiko
Min lê çandî dendiko
Te lê çandî dendiko
Xeynî vanêl vê derê
Xwelîl kesê kiniko

Lo Erdiko hezazo
Çola xwedê hezazo
Min lê çandî pîvazo
Te lê çandî pîvazo
Xeynî vanêl vê derê



www.arsivakurdi.org

Xwelîl kesê tolazo

Lo Erdiko hilmiştî[2]
Çola xwedê himiştî
Sê keçka xwe lê şuştî
Çar keçka xwe lê şuştî
Xeynî vanêl vê derê
Xwelîl kesê rûniştî.

Ez dûrika sisyan jî bi navê Meyremê ye di ber paleyê re tê gotin bi ritma giranî çawa tê xuyakirin Meyrem keçeke pir bedew û nazike û nav û dengê we li her deverê belabû ye û xeml û xêza wê, kinc û bergên wê, kil û kildanê wê, yê herî baş ji bajarê başqe-başqe ne û ji mihîna şebû jî xurtir û jêhatîtir û xweşiktire û tu baxê bi xort û lawan nake yeke hoqilbendî û poz bilinde di gel hevaleke wê jî nave wê Eyşo ye, herdû bi aqilê xortan dilîzin û meydanê ji wan dixwazin û zora xortan bi henek û laqirdî û çep û çûrên xwe dibin bi rastî tiştekî seyre, dûrik li ser zimanê serpale yê zilam tê gotin û koma palavanin lê vedgerînin bi dengekê xweş û ritmeke giran, şingîna das û qeynaxan û dengê palan dibe yek dûrik eve:

## Meyremê

Meyremê Meyremayê Meyremê
Meyremê Meyremayê Ecemê
Kihêla sere tewlayê Meyremê
Kihêla sere tewlayê Ecemê



www.arsivakurd.org

Reba[3] sere nijdayê[4] Meyremê
Reba sere nijdayê Ecemê
Xwe'l Mûsilê hildayê Meyremê
Xwe'l Mûsilê hildayê Ecemê
Xwe'l Zaxokê radayê Meyremê
Xwe'l Zaxokê radayê Ecemê
Xwe'l Heskîfê[5] kildaye Meyremê
Xwe'l Heskîfê kildaye Ecemê
Dilê xorta jê mayê Meyremê
Dilê xorta jê mayê Ecemê

Meyrem û Eyşok nazin Meyremê
Çavreş û Eyşok nazin Ecemê
Kihêlin gerden gazin Meyremê
Kihêlin gerden gazin Ecemê
Meydanê'j xorta'd xwazin Meyremê
Meydanê'j xorta'd xwazin Ecemê

Meyrem û Eyşok qîzin Meyremê
Çavreş û Eyşok qîzin Ecemê
Kihêlin gerden sîzin[6] Meyremê
Kihêlin gerden sîzin Ecemê
B'çava'b xortan dilîzin Meyremê
B'aqlê xortan dilîzin Ecemê.

---

(1)- Borbor : Bor kurtkirina Boraqê ye ew hespa ku Pêximber birye Esra û Mi 'iracê.
(2)- Hilmiştî : paqij û te miz.
(3)- Reb : Mihîn.
(4)- Nijde : keryê hespan.
(5)- Heskîf : bajarekî kevnare û tarîxiye, di keve başûrî Batmanê di bêjin Hesenkêfê.
(6)- Sîz : gewrê bi ser ezmanî ve.



www.arsivakurd.org

# SIRINC :

- Lo Erdiko : min ji devê Fatima Hacî Tahir girt, di yekê meha Nîsanê de sala 2003 Z li bajarê Dêrika Hemko, Fatim di sala 1948 an de hatiye dinê bi eslê xwe ji gundê Xelîla Torê ye, nihaka li mala şûyê xwe gundê şekirxaçî herêma Dêrika Hemko Cezîra Sûryê dimîne.
- Meyrem : min ji devê Ebdullahê Xelîlê Mele Ehmed girt, di 8 ê Azarê de sala 2003 Z li gundê Gerdinîkê Herêma Aliyan. Ebdullê di sala 1937 an de li gund bû ye ew bi eslê xwe ji kurdên mihacirên Serhedêye ji hoza Xalta.
- Borbor : min ji devê Zekoya Hesenê Hecî Mihemed girt di 7 ê gulanê de sala 1987 an de li bajarê Hesekê, Zeko di sala 1935 an de li gundê Hesê ûso çêbûye ji haza Gabaraye bera Heydaniyan.



www.arsivakurdi.org

# JI FOLKLORÊ BOTANÎ
## Li ser zarê jinan

Xwendevanên bi rêz û rûmet : Di yekê heyva Êlûnê de sala 2006 an kovara Gulistan çû herêma Dêrika Hemko û li mala bavê Cano bû mêvan. Diya Cano Gulçîna Dêrşewî ew pêşwazî kir û rûmeta wê girt. Gulçîn jineke welatparêz û jîr û jêhatiye, ji gundê Zixatiye gelek dîrokên kurdî yên kevin yên ser bûkan, destarhêrkê, cûnîkutê û berderguşî û hilavêtina zarokan ezber kirine û wan birewah û dengekî zîz û zelal û xweş dibêje. me jê xwest ku xizmeta me di vî warî de bike, Gulçîn bi dilekî fireh û coşeke bê hempa xwe da ber û xwesteka me pijirand û ev çend nemûneyên jêrîn ji me re gotin û me jî ew radestî rûpelên kovara Gulistan kirin ku ji wendabûn û jibîrkirinê bêne parastin.

**Danhev :GULISTAN**

**Berdestarî :**

## HEY LI GIR

Hey li gir li gir li gir
zîvkero heyva li gir
Wey li gir li gir li gir
zîvkero heyva li gir

Ew kî bû bûka xwe bir
hey li gir li gir li gir



www.arsivakurdi.org

Emer bû bûka xwe bir
 zîvkero heyva li gir

Bûka xwe'l hespê me kir
hey li gir li gir li gir
Bûka xwe'l hespê me kir
 zîvkero heyva li gir

Borî bû silav nekir
hey li gir li gir li gir
Borî bû silav nekir
 zîvkero heyva li gir

Gundiya qebûl nekir
hey li gir li gir li gir
Gundiya qebûl nekir
 zîvkero heyva li gir

## RUHNÎKA ÇIRÊ

L' ber xanyê mew kê ruhnîka çirê
L' ber xanyê Hacî ruhnîka çirê

Çaqmaqa mew kê barê hêstirê
Çaqmaqa Hacî barê hêstirê

De Fatim korê berdêliya birê
De Fatim korê berdêliya birê

Xêlyê girêde her ser oxirê
Xêlyê girêde her ser oxirê.



www.arsivakurdi.org

# DU KULEK

Du kullek û du kullek
Xanyê mew kê du kullek

Du kullek û du kullek
Xanyê Hacî du kullek

Jê firîn cotek werdek
Jê firîn cotek werdek

Her werdek kî weke qaz
Her heramî weke qaz

Ew Xecoya gerdengaz
Ew delala  gerdengaz

Ma ew kiye'd berde raz
Ew Haciyê'd berde raz.

**Gulçîna Dêrşewî**

www.arsivakurdi.org

# BÊRIYA WELÊT

Cegerxwîn

Ka Ferîdûn,ka Direfş taca keyan li kû ye
Ka Guhderz û ka Rustem ka ew meydan li kû ye?
Ka padîşahê Elwend , ka sultanê li Deynûr
Ka Eyûbî , ka Dêsem , kanî Merwan li kû ye?
Ka mîrekên di Baban , ka paşayê Rewandiz
Ka Cizîr û kanî mîr , ka Bedirxan li kû ye?
Kanî mîrê Behdînan , kanî mîrê Hekaran
Ka mîrekên di Zazan , mîrê Xerza li kû ye?
Kanî mîrê Hesenkêf , kanî mîrê di Sasûn
Ka mîrekên Mecenkurd , mîrê Şêrwan li kû ye?
Ka Melatya , ka Xerpût , ka Çermûk û Siwêrk
Kanî Ûrfa ka Sirûc , mîrê Milan li kû ye?
Ka Wêranşehr , ka Dêrik , ka Mêrdîn û Nisêbîn
Kanî Amed ka Hezo mîrê Hîzan li kû ye?
Kanî Stewr û ka Midyat , ka Erzen û Bişêrî
Ka Aşît û ka Hêtem , ka Gurdilan li kû ye?

Ka Bedlîs û ka Se'irt , kanî Mûş û Erzerom
Kanî Qers û Bayezîd , ka mîrê wan li kû ye?
Kanî Miks û ka Xesxêr , kanî sera Mexînan
Kanî deşta Colemêrg , kanî Westan li kû ye?
Ka Şengal û ka Mûsil , kanî Zaxo û ka Dihok



www.arsivakurd.org

Kanî Akire , Amêdî , kanî Barzan li kû ye?
Ka Ormiya û Şino , ka Sablax û ka Nehrî
Ka Selmas û kanî Xoy , ka Erdelan li kû ye?
Ka Hewlêr û kanî koy , ka Herîr û Rewandiz
Ka Şeqlawe , ka Derteng , mîrê Soran li kû ye?
Ka Kerkûk û Şehrezor , ka Hewlan û ka Deynor
Ka Kelos û ka Neşkas , ka Mehrewan li kû ye?
Ka Tenûre , ka Zelem , ka Meşile , kanî Loy
Ka Sirûçik , ka Alan , ka Dumihran li kû ye?
Ka Loran û ka Goran , ka Hemrîn û ka Sefîn
Ka ew bajar û ew gund , ka Kurdistan li kû ye?
Ka ew deşt û ka çiya ka ew av û ka giya
Ka ew kon û ka koçer , ka ew zozan li kû ye?
Ka ew dengê pezê qer , ka ew gulên sor û zer
Ka benefş û ka rihan , ka gulîstan li kû ye?
Ka kovî û ka evor , ka ew deng û qoreqor
Ka şêrîna kewê nêr , ka nêçîrvan li kû ye?
Ka ew cot û ew cotar , ka ew pez û ka dewar
Kanî berx û kanî kar , ka bêrîvan li kû ye?
Ka ew mêrg û kanî deşt , ka ew bax û ka buhişt
Kanî seyran , kanî geşt , ka ew dîlan li kû ye?
Ka ew xort û ka kurik , ka ew şal û ka kerik
Ka govend û ka keçik , ka zirnevan li kû ye?
Ka Dilşad û Gulîzer , ka Şêrîn û kanî Zîn
Kanî Eyşê , ka Fatê , ka Perîşan li kû ye?



www.arsivakurdi.org

Ka ew mêr û ka ew jin , ka ew kalê rihmezin
Ka lêlê û ka lolo , ka ew heyran li kû ye?
Ka ew ken û ka geşî , ka şadî û ka xweşî
Ka sersal û ka nûroj , ka mihrecan li kû ye?
Ka ew ava sar û xweş , ka gundor û ka zebeş
Ka birinc û ka genim , ka dobelan li kû ye?
Ka ew zîv û ka ew zêr , ka kaniyên gaz û qîr
Ka ew terş û ka talan , ka ew dewran li kû ye?
Ka welatê me rengîn , îro jar û birîndar
Cegerxwîno de bigrî , kanî derman li kû ye?



www.arsivakurdi.org

# xemla windayî

**Salihê Heydo**



Zerîya kurmanc rind û ciwanî
Tu xwe girê de b'xemla Mîtanî
Cotê hibriya li xwe bipoşe
Li ser girê de şerpa dor'anî
Kitana meles bi ser de berde
Kofyê girêde şar Kesrewanî
Yan şerpa şîrkî rengê konikî
Bipêçe li ser şala Axbanî
Tu qolê zêra rêzke li dû hev
Bera şewq bidin por û pêş'anî
Wana girêde l'ser çelemçîtê
Tev Mehmûdî bin zêrê siltanî
Wî biyandûrî tu hilawîze
Li nîveka qol bête xuyanî
Cotê guharanbi deh pelka ve
Di gel 'irênê xizêm ridwanî
Pozê çilakî bera bi îse
Zêrê bîst û yek lêbin mêvanî
Por bixemilîn bi wan şehika
Cotê maşella bike nîşanî
Tu gerdena gewr bi zîv û qirûş
Kevrê heqîqe rista karbanî



www.arsivakurdi.org

Çend ristê morî di gel xaziyan
Xinaqê çêke b' gogê mircanî
Zincîra zêra têde qelenês
Deyne ser singe b'qatê giranî
Heyasê zîvîn bi qulp û kember
Girêd li nava bejna rîhanî
Şohiya rengîn gulk û gulabend
Bi kespikan re berde ji banî
Li zend bipêçe bazin û badek
Li jêr berbazin li jor dezvanî
Gustîlkê tilya bi qaşê mermer
Ya sefa buha rengî keyanî
Xilxalê zîvîn li ser gwîzekê
Bi gog û şirik gora Mûşanî
Biska tu şeh ke kezya vehûne
Çavê reş bide kilê sibhanî
Kilçîvê darîn zirav û nazik
Timî dagre ji wî kildanî
Kirasê hûçik şalê gulgulî
Bi bejnê de berd ewî xeftanî
Cawê qedîfe bik paç û pêşik
Yan jî çitare bi terzîvanî
Koban li ser xe bi xerc û qeseb
Da şewqê bide b'rewş û rewanî



www.arsivakurdi.org

Gumgumê Mîtan millan têrake
Bi çoxê surme wa bi giranî
Dellingê bi nexş nîşana te ye
Qumaşê buha qelemsultanî
pêşmalka gulî cotê qemçikan
Di gel binkirask sed reng û şanî
Şimka reqreqûn ji terse bedew
Bi ser niga vek were ji banî
Tê bibe qumrî kewa perîreng
Ewe nîşana dewra Mîtanî
Çendî bi xemlin post û perên te
Tu keskesore li wî ezmanî
Cil û bergên te ji bo me ale
Pê ser bilindin di her zemanî
Tûyî xatûna Gurc û zerîya
L'Cezîra Sûrî rengê Milanî
Bi vê tîtalê heger bê diyar
Ferişt û perî dibin qurbanî
Gurciya Mûşê fedîkar dibe
Belqîsa Sebi' ji te çi zanî
Roj dire ava heyv xwe vedşêre
Sitêr duqrijin ji wî ezmanî
Tê bibe horîk ji yên buhuştê
Wê her kes bibê xwezîb wî canî



www.arsivakurdi.org

Emrê cilên te çar hezar salin
Heyfe ku îro man bê xwedanî
Ey keça kurdî behwerkî ji min
Li ser te digrîn xemla te kanî?
Ger bi vî terzî ez te bibînim
Te dixim dil de bi şekr û şêranî
Bi e'şq û evîn dê te himêzkim
Ji lêvan bibim sed ramûsanî
Ez rûmeta te gelkî dizanim
Nebe tiyatro b'reşa erzanî
Da sivik nebe li nav civatê
Ku kurd nebêjin sere me danî
Pêşketin xweşe ez tim pêre me
Ne bi vîzyone vêna bizanî
Xwendin û zanîn xemla welêtin
Lê rewşa durist hizr û ramanî
Ger totik nebe çiye bedewbûn
Mûdêla îro ewe nezanî
24 avdarê - 2004

**50 Saliya Partya Pêşverû Pîroz**



www.arsivakurdi.org

# KEÇÊ DÎNÊ

*Ferhad Çelebî*



Keçê dînê
Demên razana min
Ji sawîra xwere bêje :
Bila dûrî min here
Serê min neke gêje
Agirê nava min
Bese min pê bipêje
Keçê dînê
Ji te hizdikim
Lê neçaran ji min
Nexwaze
Jiber ku ne Siyabendim
Bo xatirê hêstirê Xecê
Bibim qurbana
pezkoviyan ,

Ne Şepalê Cegerxwînim
Bo Stêra naz
Bibime perîşan
Û li ber destê Bixdo
Bême kuştin .
Ne Memo me
Di zindanê de birizim
Bo sawîrê Zîna zêdan

www.arsivakurdi.org

Razî bikim
Beko yê pepûk
Ji buhiştê biqewrînim ..
Ne Ferhadim
Bo çavê Şêrînê
Çiya bi neynûkan bikolim
Ta dawî dînbibim ..
Keçê dînê
Bi hêvî me

Tu van neçeran
Ji min nexwaze
Ji ber ku
Bavê te ne axa ye
Û ne ez
Kolê ber destê wî me
Tenê tiştê ku dikarim
Bo te bikim
Û lê ne poşmanim
DÎNÊ ..
Dikarim siyanîd
Û Xerdelê
Ji dêvla te vexum
Û şadîmanî te
Maç bikim
Û bi jîn bibim .

***19-07-1997***



www.arsivakurdi.org

# Koçberî

*bavê nisrîn*

Perdeyên reş
Hatine dakêşandin
Di hemû rêçên bajarê
            Nan de..
Tiştekî nabêjim
Ta bi ketinê..
Hestiyên dost û hogiran
Derbûne
Ji cendekên wanî avîtî
Di şexteyê de..
Westiyam..
Westiyam..
Ta qirbûnê
Rêça min gelkî dirêje
Bihêlin
Di oxirê de ez herim
Bajar li piş jiyanê ye..
Bihêlin
Bê xatirxwestin ez herim
Sûnda min ji we re..
Bi kaxezên li ber ba dibin
Bi xurcika minî ji
Peşkên xewna..
Ezê çavên xwe bigrim
Bêdengîyê bikeritînim..
Lê naxwazim..   Bi çûna xwe..
Rojyarê şiyarkim.



www.arsivakurdi.org

# Evîn û hêvî

Luqman ibrahim



Gotinê min mirin
Li ser lêvên sar
Nerînê min vemirîn
Ji hêsra ..
Gava te barkir yar û ..
Ez û şevê bûn heval
Te ji mire hiştin
Riyên dirêj û bîranîn û
Hêviyên winda û
Gelek birîn û
Xewnên şiyar
Bîranînê min
Mîna pelê derya
Min dibin û tînin
Nerînê minî windayî
Di nav riyên xwar
şevê kirasê xwe
Berda ser jiyana min
Ewra winda kir
Hêviyên minî bê sûc û
Di sînga min de
Hiştin axînê min

10/7/2007



www.arsivakurdi.org

# DILEK

**Evîna Şikakî**



Ne tuyî rengê jiyana min
Û ne tuyî tama viyana min
Ne … û ne tuyî
Ne tuyî Leylanê min bêxê gul
Û biçînê di dil de sînem û sorgul
Ne tuyî
Ne tuyî ji bêriyê sot bike
Min şaş bike…min ji rê bike
Na… ez nahejim û na weşim
Û ne… ezim
Ew gula tu bên bikî
Û xemê xwe li milê wê bar bikî
Û cavê xwe ji dîtna wê kil bikî
Ji… ber ku
Ez bi dilkî me
Û tu… bi sed dilîye.

www.arsivakurdi.org

## ÊXSÎR

SOBAR AR<

êxsîr bi wan çava tuwî
Girtî bi wan rava tu wî
Perkende nêv dava tu wî
şaha siwara her ezim

Riştî bi xwîna sor tu wî
bê çar û yê rencor tu wî
yê hundurê Sînor tu wî
Banga hewara her ezim

Qerqef di şûşa zer tu wî
Ava çema xweş\tir tu wî
çîçek ji şitla ter tu wî
Mêşa kiwara her ezim

Heyva li ezmanî tu wî
Nexşa bi dest Manî tu wî
şahî Sulêmanî tu wî
Pelqîz xewara her ezim

Karwan di çin rêber tu wî
Cergê Bi xwîn keyber tu wî
Fîxan û yê d,lber tu wî



www.arsivakurdi.org

Mirya şiwara her ezim

Exterme nêv kaxa tu wî
Extirme n.v taxa tu w,
Laşê Li ber daxa tu wî
Luqman li wara her ezim

Bê şens Memê Bendî tu wî
Jana Siyamendî tu wî
Ferhad li ser tundî tu wî
şêrîn buwara her ezim

Hovê Li nav çola tu wî
şahê Li nav kola tu wî
Sobar ! wekî bola tu wî
Nêv bendewara her ezim

www.arsivakurdi.org

# KOÇKA DILDARAN

**NARÎN UMER**

Hêsrê guldaran xunava
    Naveroka zik hinava
Lavija oldar buhişte
    Nasebîna xelkê nava
Derfetên mana merovan
    Jîn di gel dayik û bava
Şewşenê ewran bi lerze
    Xak û ezman bûn du gava
Warê tillûran hêlîne
    Cihêma lawir delava
Formê vînê çi duriste
    Dest hejane'd gel silava
Halêza eşqa min û te
    Rewşen û alav û lava
Xanê tac û tevn û tore
    Servehûnan'b awrê cava
Dane mînin xelkê çewte
    Vîn dikin her sist û xava
Hola meyxana melê da
    Xewnedarin bûk û zava
Çav wekî wan xewnedaran
    Xweş tu danî kûredava
Hespê çengîn wekferişte
    Her siwar lê dil elava
Roja ber xoşî û keyfê
    Hespê vîndar û kucava
Rast qunaxên behwerî bû
    Soz û peyman wek xunava

www.arsivakurdi.org

Erezû yek rû û şane
Ezwer û vîn û bizava
Çav li benda dîtina te
Wek nerîna rok li tava
Têm bero vîna te bosta
Dûr diçî sed bost û gava
Xurt mi girt rayên evînê
Tew te girt alyê zirava
Arpêjên hasten me xurtin
Şaxê kûr'l herder belava
Wer heval can pêkve biçne
Warê şîndayî û ava
Dengê awazê çemî ra
Geştê arasa gulava.

☆ ☆ ☆

**Ji fuliklorê koçra- lavêjog**

***Danehev- salar***

Ava mezin wa jî xul xul tê
Pêla navê ji kevirê qul tê
Kaxeza min û bejnika bilind
Li serê zozanê jorî cem gêwir tê
Ezê rabim xanîkî çêkim ji qeşayê
Ezê kulek û pencera çêkim jî alyê bayê
Ez û bejnika bilind dêmên sorgulî
Xwe têda xweyîkin hersê heyvê sermayê

www.arsivakurdi.org


***Salar Ebdiletîf***

**- *Rizqê* diza li Dîna ya**
**- tune dîtî savar li cem eyde**
**- çav lê kirin mal xira kirin**
**- ne dikê nêçîrê û ne dihêlê kew biçêrê**
**- kê dinya dot yê kirî û firot**
**- emrê dirêj dighê hemi mexsewa**
**-te li desta li bazina ya şêx û mela dikin xwelî li me cahila**
**- şêx û mela firîk xwarin hîn şîn ,**
**got feqîr here kareki ji xwera bike**
**-adarê berf giha gulya dare ne giha danê**
**êvarê ne li vêdê berya çîyayê şingalê**
**- mastê peyîza bidin ezîza**
**- ser dîyarî hespe û şon dîyaî qespe**
**- tirba siwara kolaye**
**- pez dibêje : xwezî xudanê min yê pêşîba-**
**dako xwarna min tim çûnga mazîba**
**- ji welîya çêdibin xwelîya -**
**û ji xwelîya çêdibin welîya**
**- jêrê xeber jor, tu ne zanê ne guhdan,**
**tu ne kiryê gelek xwar.**

www.arsivakurdi.org

# ÇIMA NIVÎSANDIN ?

Kabreşê Berwarî



**Sernivîsero :** Tu li çî xwe digere, ez nizanim ? tu hatiye rûpelên kevin vedike, yan jî tu hatiye xortaniya xwe di bîra xwe de tîne, de dev ji xwe biqere û li cihê xwe rûnê.
Ma kî ji min û te re valaye, her yek bi xwe daketiye .

* * *

**Sernivîsero :** Tu çi ji min dixwaze, welle û billeh ez ne vala me ji nivîsandinê re, û nivîsandin jî min re ne valaye.

* * *

**Sernivîsero :** Her dem ez dibêjim ; ev gotina dawiye, lê ev (( nivîser û helbestvan )) nahêlin ez li cihê xwe rûnêm, û gotina dawî bêjim. Ev bûye li dora bîst û pênc salan ku ez hogirî nivîsandinê bûme û gelek rûyên nih di ser min re derbas bûne, her yek sitranek di serê wî de ye. çi gava ez yekî dibînim ez di bêjim deva dawiya gotinê hat, lê dawî nayê û bêtir gotin destpêdikin .

* * *

www.arsivakurdi.org

Çi gava ez kovarekê yan rojnameyekê bi zimanên din tînim nabe ku çend navêd xortêd me tê de tune bin, ez nizanim çima em xweş nêçîrvanin ji xeynî xwe re, lê em bikêrî xwe nayên, çima em mala xwe bi destê xwe xera dikin û em serê xwe bi destê xwe dişkînin. Alem li serê me digere û em jî li serê xwe digerin.
* * *
**Birano :** Tucaran mekevin behweriyê dema ku xelatan bi me vedikin ku ji bo nivîsandinê ye, xelat ji ber ku em çermê xwe ji xwe dikin û çermê wan li xwe dikin didin me.
* * *
**Birano :** Nivîsandin ne tenê em binivîsin, lê nivîsandin ewe ku em bi zimanê xwe binivîsin yanî em zimanê xwe biparêzin, yanî em hebûna xwe biparêzin.

www.arsivakurdi.org

**Naverok**


| Gotar | Niv,skar | R/pel |
|---|---|---|
| pêşgotin | gulistan | 2 |
| GOTAR ? L>KOL<N | | |
| Zimanê kurdî biparêzin | Selman Heso | 4 |
| Di 50 Saliya Damezrandinê | Elî Şemdîn | 6 |
| Ji şîretên Mîr Celadet | Konê reş | 22 |
| Jin Jiyane | Fewaz Hesen | 26 |
| Çîrok | | |
| Ber bi rojavade | Alan Elî | 27 |
| Di baskokirna xwena de | Mehmûd badilî | 29 |
| Mizgefta sor | Şiyar Silêman | 35 |
| Cindoyê Gavan | Bavê serbest | 39 |
| JI FOLKLORA KURD< | | |
| Çend dûrik ji fplklorê kurdî | Salihê Heydo | 43 |
| Ji Folkulorê Botanî | Gulistan | 49 |
| HELBEST | | |
| Bêriya Welêt | Cegerxwîn | 52 |
| Xemla Windayî | Salihê Heydo | 55 |
| Keçê Dînê | Ferhad Çelebî | 59 |
| Koçberî | Bavê Nesrîn | 61 |
| Evîn û Hêvî | Luqman Îbrahîm | 62 |
| Dilek | Evîna şikakî | 63 |
| Êxsîr | Sobar Arî | 64 |
| Kocka dildaran | Narîn Umer | 66 |
| Gotinên Pêşya | | |
| Gotnê pêşya | Salar Ebduletîf | 68 |
| Gotina dawî | Kabreşê berwarî | 69 |


www.arsivakurd.org



**Ji Ahinga 50 saliyê li Qamişlo** 14/06/2007

**Dîmenê Pelê Pêşî : kert postala taybet bi 50 saliya partya pêşverû**
**pelê dawî** : dimen ji Ahinga 50 saliyê li Qamişlo

di sala1968an de Cegerxw,n
damezrandiye / b/ye berpirsyar. W. ]

www.arsivakurdi.org




**ji Ahinga bîranîna 50 saliya partiya pêşverû li qamişlo**